NAVEND -
Zentrum für Kurdische Studien e.V.
Navend ji bo Lêkolînên Kurdî
Center for Kurdish Studies
Centre des Etudes Kurdes
ناوەندی لێکۆڵینەوەی کوردی

Geschäftsstelle
Bornheimer Str. 20-22
D - 53111 Bonn

Tel.: +(0)228 / 65 29 00
Fax: +(0)228 / 65 29 09

Postanschrift
Postfach 74 45
D - 53074 Bonn

e-mail:info@navend.de
Internet:www.navend.de

Bankverbindung:
Sparkasse KölnBonn
(BLZ 370 501 98)

NAVEND e.V.
Konto-Nr.: 310 206 13

Daxuyaniya Çapemeniyê

NAVEND e.V. "Forûma Perwerdeyê û Zanebûnê" damezirand

Li ser vexwendina **Navend ji bo Lêkolînên Kurdî (NAVEND)** roja 31'ê cotmeha 2009'an pisporên ji warên dibistan, sosyalpedagojî, zanistên terbiye û dêbav li Bonnê hatin cem hev. Danûstandin di çarcoveya mijara **"Rewşa perwerdeya zarok û ciwanên kurd – rewşa aktûel û perspektîf"** pêk hatin.

Di plênûmê de ev pirs hatin guftûgokirin: Tiştê ku taybetmendiya rewşa zarokên kurdan destnîşan dike, çî ye? Kîjan hewldanên taybet ji bo civaka kurd ya pirrengî pêwistin? Kîjan naverok divê ji bo dêbavan bên gihandin? Çawa bi dêbavên kurdan re pêwendiyê dikare were sazkirin û bi wan re bi berdewamî xebat bê kirin?

Ji bo ku ji bo dêbavên kok kurd bandora dualî ya perwerdeya li dibistanan ji aliyê mamosteyan li aliyekî û karê dêbavan li aliyê din ve, bê ronî kirin û ji bo ku bi wan re stratejiyêk hevpar bê afirandin, beşdarvanên vê civînê biryara damezrandina "Forûma Perwerdeyê û Zanebûnê" / "Forum für Erziehung und Bildung" (FEB) di bin banê NAVEND e.V de standin û komeke kordînasyonê hat avakirin.

Karê forûmê wê li ser çar stûnan be:

1. Avakirina hevgirtinek bi hemû hevkarên beşdar ji sektorên perwerde û terbiyeyê
2. Afirandin û bicihkirina hewlên piştgir ji bo piştgiriya dêbavan û xwebixwetemsîlkirina dêbavan
3. Lêkolîn li ser rewşa aktûel ya malbatên kurd û îmkanên beşdarbûna wan di derfetên perwerdeyê de
4. Proseyek vekirî ji bo bipêşxistinê, tevî tevlîkirina pispor û dêbavên eleqedar

Di civînên pêş de wê li ser babetên bingehîn bê rawestandin û bi rêkûpêkî çalakiyên di derbarê aspektên cuda yên terbiye û perwerdeyê bên li dar xistin.

NAVEND e.V. pispor û dêbavên eleqedar vedixwîne ku tevlî vê proseyê bibin.

Bonn, 03.12.2009